



HÊVÎ

kovara kurdi ya zarokan

Hejmar: 4 Gulan 1981





HÊVI

kovara kurdi ya zarokan

Hejmar:4 Gûlan 1981

-TÊXISTINÎ

HEDLIK Û BEDLIK.....	2
DESTE WÊ DI LERIZE.....	6
HEŞ.....	8
GURIYE KEVOKVAN.....	10
DI SALEKÎ DE ÇEND MEH HENE?.....	15
ZAROKÊN ME.....	16

HEDLIK Û BEDLIK

Geli zarokên hêja,

Wexteki bızineki û du karikên wê hebûne.
Navên karikê wê yek HEDLIK û a dın ji BEDLIK
bûne. Diya wan, pır ji wan hezkiriye. Gava ku
diya Hedlık û Bedlıkê diçû çiya çêrê, lı wan
şiretên weha dıkir:

-Hedlık û Bedlık a mın ya delal, ez gava
derım çiya hûn deri ji para rınd û baş big -
rın. Yekê ku lı deri xıst, dı terkên deri re
baş bınêrın, ger ez ne bım, qet deri ji kesi
re venekın. Neyarê me gur heyê. We ne xapine û
we ne xwe...

Bızın her roj diçû der, lı nav çayır û çi -
menên kesk de diçêriya. Ava zozanên sar vexwa
riye. Kayina xwe aniye. Guhanên xwe tije şirê
ter û teze kiriye. Ber bı riya malê girtiye .
Şirên xwe yê ter û teze daye Hedlık û Bedlık
ka xwe. Wan wek roniya çavên xwe parastiyê
û mezın kiriye. Diya Hedlık û Bedlıkê gava ku
ji çiya veşeriyaye malê, lı ber deri her du
qıloçên xwe dı deri de daye û bı deng bana
Hedlık û Bedlıkê kiriye:

"Hedlık a mın, Bedlık a mın

Diya we tê ji zozanan

Disa ji we re aniye

Şirê terê ser guhanan

Vexwin mezın bibın

Wek karikên xezalan

Lezkın deri vekın."

Hedlık û Bedlık ew çax dı terkên deri re
mêze kirine. Lezkırine, lezandine û deri ji di
ya xwe re vekırine. Hedlık û Bedlık devên xwe
xıstine guhan û memikên diya xwe. Şirê ter û

cemdi vexwarîne b1 noşicani.

Rojeki disa diya Hedlık û Bedlıkê, l1 zozanan bûye. Çûye çêrê. Gur b1 vi rewşê agabhûye. Rabûye, lêxîstîye çûye ber deriyê Hedlık û Bedlıkê. Nîgên xwe l1 deri xîstîye:

-Hedlık mîn, Bedlık mîn deri vekîn, ez hatîm. Ez diya we me.


Hedlık û Bedlıkê d1 terkên deri de mêzekî rîne ku, ev ne diya wan e.

Wan herduyan b1 deveki bersivdane:

-Tu ne diya me yî. Qîloçên diya me hene. Mûyên diya me ne weki yên te ne. Em deri jî te re venakîn.

Gur paşda çûye. Postê bîzîneki l1 xwe kirîye. Disa hatiye ber deri û l1 deri xîstîye:

-Hedlık mîn, Bedlık mîn deri vekîn, ez hatîm.



Wan cardın dı terkên deri re mêzekırıne. Qıloçên wê hene û rengê wê ji wek rengê diya wan e. Rabûne deri vekırıne. Gurê bırçi hatiye hundır û herduyan ji ser hev xwariye. Dawi bı zıkê têr û bı qureti tama devê xwe xweşkırıye. Zmanê xwe lı der û dora devê xwe xıstiye. Meşiyaye û çûye.

Bisteki paşê ,diya wan hatiye. Çı bıbıne baş e? Ku deriyê malê lı ser pıştê ye. Ne Hedlık, ne ji Bedlık heye. Bankırıye, qıloçên xwe dı diwaran daye û bare bar kırıye. Dawi de tê gıhiştiye ku ev karên xırab jı gur tê.

Bı barın û bı qirin, bı kezebeki şewiti û pırpıtı bazdaye çûye ba hesınkar. Bı eşêleki kelogırı, kul û keserên xwe jı hesınkar re go tiye. Lava jı hesınkar kırıye û:

-Ez ketıme bextê te hesınkaro! Tu qıloçên mın baş tûj bıke ku ez, dı careki de ûr lı gur bıkım der. Lewra wi her du karıkên mın xwariye. Heyfa her du karıkên xwe yên xezal jê bıgrım.


Hesınkar ji pır dılziz bûye. Bı dıl û can her du qıloçên wê tûj kırıye. Dırav ji jı bızınê ne stendiye.

Bızınê xwe lı ser riya gur veşartiye. Haya gur qet jı bızınê tunebûye. Bı zıkê têr hêdi hêdi meşiyaye. Hatiye ber bızınê. Bızınê jı nişka ve qıloçên xwe yên tûj bı pit û hêz lı zıkê gur xıstiye. Ûrên gur berdaye der. Gur dı ci de ser pıştê ketiye erdê. Hedlık û Bedlık jı zıkê gur bı jini bazdane der. Çawan di ya xwe ditine, ber bı diya xwe lotık dane û dı evin û dılxweşiyê de wındabûne. Pır ji bır çıbûne. Ketine bın diya xwe û şırên wê yên


ter û teze vexwarîne. Diya wan ji, b1 dîlxweşi
 wan halastiye û kêfxweş bûye. Hedlik û Bedlî
 kê girtiye û çûne koza xwe.

Geli hevalên hêja !

Em j1 yekê heta reqema mezûn, b1 xêzîka hemû
 reqeman bîghînin hev. Wêneyên ku derket, navê
 wan bin wan de binivsin. Me hîn tipên na-
 van nivisandîye. Yê dîn hûn dê binivsin.



K . Ş . İ



P I Ş İ K


DESTÊ WÊ DILERIZE

Mala Dunyaşka, Maleki pır bı zarok bûn. Dê, bav, du xwişk, du bra û pırıka wan hemû tev hev, dı malekê da rûdiniştın. Dunyaşka heft sali bû. Piçûka malê bû. Mezına malê pırıka wê bû. Pırê 82 sali bû. Gava ku nan dıxwar, her tım destê rebenê dilerizi. Çaxa kevçi dıbir devê xwe, şorbe dırıjand...

Gor adetê gund, dê û bavan yek carna mamostê gund dı ezıbandın nan. Mamoste, jıbo naskırına halê malên xwendevanê xwe, jıbo jıyana xwendevanên xwe dı nava mali de hin jı nêz ve bibine, ev ezıbandınan bı kêfxweşi qebûl dıkir. Dıçû lı ser sıfra wan rûdinişt.

Dunyaşka mamostê xwe ezıbandıbû şivê. Pır bı heyecanbû. Hemi fıkarê wê, pırıka wê bû. Dı-tırısiya ku bı wê destê wê yi lerızok wê şorbê birjine. Lı ber diya xwe geriya:

-Dayê çı dıbe, bıra işev pırıka mın lı ser sıfrê rûnene. Wê cardın destê wê bilerize û şorbê birjine. Em ê lı ba mamostê mın rezil bıbın.



Diya Dunyaşka kır ne kır tu peyv ne kır serê Dunyaşka. Dîlê dê tenik e. Dayax hêsrê ça vê qiza xwe ne bû û dawiyê daxwaza Dunyaşka ya ecêp bê dîl qebûl kır. Pırîka Dunyaşka hemûyê gundiya jê hezdıkır û xatırê wê dıgır - tın. Pıra 82 salî, hemûyê jiyana wê, lı hember neheqiya, dı tekoşinê da derbasbûbû. Gor ew xı zan bû ji, lê xızaniya xwe bı hın kesê dın rê par ve dıkır. Ger dı dest wê da rubleke (lîrek wê heba, nivi dıda yeki dın. Tekoşina pırê demekê lı hember axa da bû, hatı bû guhê mamoste ji.

Dema ku deri lêket Dunyaşka bı kêf bazda deri vekır. Vaye mamostê wê hatıbû. Kelxuya şorbê hundır girtıbû û bina nane lı odê belav bûbû.

Mamoste, gava pırîka Dunyaşka lı ser sıfrê ne dit pır şaşbû.

-Pırîka we lı ku ye?

Dê û bav lı wecê hev nêrin. Dê fıkrı ku , rast gotın wê hın baştır be,

-Tu zani pırîka me pır pır e. Çaxa şivê dı xwe destê wê dilerize. Şorbê dırjine. Jıbo ku lı hember te rûsar ne be qiza me Dunyaşka ne hişt pırîka wê bê lı ser sıfrê rûnê.

Mamoste hêdi kevçi berda sêniyê û veğeriya ser Dunyaşka, jê re got ku;

-Tıştê te kırıye ne rast e, Dunyaşka. Hin tu bıçuki. Ez hêvidarım ku wê torinên te ji wê çêbın. Ez hêvidarım ku, tu ji qasi pırîka xwe bıji û pır bıbi. Û ev tıştê te lı pırîka xwe kırıye, ewê lı te ne kın. Hemû insan gere tım alikariya hevdû bıkın. Kesên kal û pır hin bêtır muhtacê alikariyêne. Rabe here pırî

ka xwe bine ser sifrê. Ger şorbe rijandina wê hewqasi te ditirsine, kevçî jî dest bigre û sîva wê pê bide xwarin.

Vassili Soukhomlinski

Niviskarek jî Sovyetîstan

HEŞ

B1 w çinê b1. D1 cîniyê xu'r şî kuliya . Yo hep weş ame, yo hep wape mend. Haw ku weş ame , hiwiye cîniye vînderd. Şiye hon ra. Haw ku wape mend ame ko yo hon d1. Ya n1 hesna. Am1 kene. Cî niye bin1'k ko hesiye ko nêmi şaw kuli xu der we, nîwaşt ra. Fetliye ko yo heş ya sera. Heş ya baş1 lan xu. Yo lacek c1'r b1. Fek lan heş b1-roc qawno. Miyen lan yo tîrîç rocîna. Haw lacek xu(xo) den pero. Nişko devşa, teyşiya. May c1 c1'r vano:

- "Haw çîba w?" Lacek vano:

- "Yo çîba tiye b1, m1 nişka devîştin1." May c1 c1'r vano:

- "Hana tîrîç roc u law, roc esto bişaw esto" Lacek vano:

- "Ko hecuna êçî'r ma tiye vînderda?"

- "Ênê law fek lan qawniyew." Lacek fek lan

ke a, xu'r şiyê ko heş ko qoçik tı; yo çenti
pır qoçik kerdo, haw ciniye ri beşeni. Ciniye
terso: "Hanhey ma kuşu."

Zey cı, goy cı teyna man heş. Yo qul dan heş
rı, heş mıro. Ciniye o zey xu yenê daw. Mêrdı cı
niyê esto. Milet daw, haw mêrik rê vano:

- "Zey to, zey heş o. Ya bıkuşê!"

Yo roc may cı bı parxêl ya rışiyên çiyay Ha
ti-Nehati kuliya. Şen haw çiya xu'r kuli top
kero, wini tera ko yo şêr gay cı wero. Şêr ri
vano:

- "E to'r vana mewu! E to ker bin parxêl....
"Gay cı wero, haw lacek yeno ya ker bin parxêl
gır dano. Don ji wini tera ko yo heş gay cı we
ro. Lacek heş rê vano:

- "Mewu! Ez to ker bin parxêl ." Heş gay cı
wero. Lacek yeno heş ker bin parxêl, gır dano,
yeno daw. Milet daw pêw cı'r remo. Yen Kehe. Haw
şêr o heş ver do şena xurê. Haw lacek may xu'r
vano:

- "E zana ko şıma mı kêr vini, ez xu'r şena."
May cı cı'r vano:

- "Meşo law!...." Lacek veno:

- "Bı xatır to." Şen yo del wini tera ko yo
duman vaz ra. Şen wıdı ko yo kalık yo quşxanı
savar naw sera, pocu. Lacek veno:

- "Selamo'elek" Van:

- "Eleykomeselam."

.....

Geli zarokên heja!

Ev çiroka lı jor bı zoravayê dımali ango bı
zazaki hatiye nivisandin.



GURIYE KEVOKVAN

Diya wi bî tenê rûnişt, nanê xwe xwar, hinek ji jî şirê bızinê vexwar. Pîştî wê razane. Guri beri razanê girara hemî mayî avêt ber kevokan.

Gava bu sibe, disa kumîk xîst serê xwe, çû ser xani, dest bî fikandinê kîr û kevok fîrand. Dî destê wi da darek serî bî potîk hebû.

Qîza paşeyî nexweş dî nîvinê xwe da mêzekîr, çî bîvine? ku kevokên Guri disa lî ser xani dîfirîn. Û dengê fikandinêkê jî tê, lê Guri ne lî meydanê ye. Hewdarekî bî potîk ku lî hewa dî gere û kevokên kîş dîke ber bî çavê wê ket.

Çend kesan xeber gihandin paşê û wezîr, gotin Guri disa kevokan dîfirîne. Paşê bî tîrsa girînbûna nexweşîya qîza xwe, dîsa wezîr şand bo kuştina kevokan.

Lî alê dîn qîza paşê dî mîraqa Guri da bû. Bî qewraşa xwe ya dev bî şît û bawer pê tê ra xeber dîghîne diya Guri. Dîbê, ez pîr jî Guri hez dîkîm, dîlê mîn ketiyê, çî dîkî bîke çarekî jî vî îşî ra bîbine.

Dı vê nabêrê da, hemî dewlemêndên bajêr, dı seroktiya Heci Eli de dıçın qesrê, derdikevin



hızûra paşê. Dîbêjin:

"Paşê me, em hatin şelandin. Ordiya xwe bîşine bira dîza bîgrin, malê me paşte vegerinin. Tu paşatiya xwe dî vê royê da nişan ne di, ka tê kingê nişan bîdi."

Guri ji hê lî ser xaniyê xwe bû, Kevok dîfirand. Dapira wî, lî seri çarîkek, jêr hîri dîrêsa. Bîzin ji lî bexçe dîgeriya û pelê tuyê dîxwar. Carekê jinîkê serê xwe rakir, lî bîzinê nîhert. Bîzinê ji lî wê, wek bêje "Guri ji, kevok ji dî talûkê da ne. Rabe pelê tuyê jî mîna re dawşine, ku ez bêjim tê çî bîki." Hema jî ciyê xwe pekiya, bî şivekê lî dara tuyê xîst. Bîzinê hingî pelê tuyê xwar, zîkê wê wek defê werîmi. Disa derbasî hember bû û lî jinîka pîr nîhêri. Vê carê wek ku bêje "Destê te xweş heydê tu têkeve hundîr, ez derdîkevîm serê xanî alîkariya Guri û kevokan dîkîm." jinîka feqîr bê deng ketîye hundîr. Bîzin ji jî papluka hîlkîşiyaye serê xanî, qedereki jî jî kome dîrîkê wêderê xwariye.

Dî vê nabêrê da, mîrovên wezîr ketîne bexçe. Ew darê lî jor dîhejiya û kevokan kîş dîkîr hebû, dest pê kir lî serê mîrovên dîxwestîna bî xanî da rapelîkîna, bî jor ket, wan gundorî jêr kir. Pîştî ku, mîrovan famkîrîna serî pê dîna - xîna, revîna hatîna nîk wezîr.

Pîştî ku qîza paşê vana dît, parîkî dîlê wê hat ber. Tîrsa wê revîya.

Gava dewlemendên ku serokatiya wan Hecî Elî dîkîr, bî paşê ra runîştîbûn lî ser vî dîzê jê hatî ku çewa dî şevêkê da hewqas mal û pere dîziye û mala şelandîye dîaxaftîna, wezîr bî lez ket hundîr. Got:

"Paşê mın, işê xerib dıbin, Guri, lı meydanê nine, lê şıva wi lı ser xani kevoka dıfirine . Na hêle kes nêzi kevoka bibe."

Paşê ferman kır, go;

"Guri bıgrın, binın ba mın!"

Wezir:

"Paşê mın" go. "Mın a nıha ji got, Guri lı meydanê xuya nake. Lı malê hew diya wi heye. Di ya wi ji tu tıştı nızane."

Heci Eli'yê xwediyê kargehên musade xwest go;

"Paşê mın, çı hebe dı vi Guri de ye. Ez texmin dıkım ê ku me şelandiye ji ew ew e."

Dest pê kır behsa kembûna hingiv û to yê sıfra xwe kır.

Dewlemendeki dın:

"Lı ber çavê mın, qolya jına mın jı stuyê wê wenda bû" go.

yeki dın ji go:

"Eyna meyi dor bı zêr ji jı refê fıri çû. Heta mın xwe avêtê wında bu. Heci Eli raste çı hebe dı vi Guri de ye."

Paşê hêrs buye, fermana amadekırına ordiya xwe kırıye. Gotiye dora malê bıgrın sax yan mırı Guri jı mın ra binın.

Dı vê demê da qıza Paşê, bı xewraşa xwe ya dev şıddandı ku gava berê wazife dabiye dıaxaft. Qewraşa jı ba jinka extiyar hatıbû dıgot:

"Qet mıraq ne ke. Diya wi jı mın re go Guri diji, û rehetê. Heta go eze iro bışınım cem wê, bira pêre bıaxafe."

Qıza paşê ecebayi maye:

"Çewa dibe.Vıra ewqas bî şit tê parastın ku ewqas bendî wê çewa derbas bike,bê ba mın ?Ax ax xwezıla bihata...."

Qewraşê go:

"Hezar hinerê Guriya hene.Hela em lî benda şevê bın,tê bivini wê çewa bê"

Gava vana diaxaftın çavê wan ber bî pencerê bû.Çi bivinin? Leşkera dor lî mala Guri girtî ne.

Qiza paşê,dî dilê xwe da:

"Wi rebeno" gotiye "Hezar canê wi hebe nika re yeki ji xelasbike."

Kevok êdi ne lî hewa bûn.Lî ser xani qût dıxwarın.Dar ji ne dileviya,lî qurakeki sekı-nibûBızın ji ji aliki dırıka dıxwar,jî aliki ve ji bişkulê mezın qasi ku seriya bişkanın dıkir.

Gava destê wan lî ser çek leşkera dıqan fermandarê wan bang da:

"Ho Guri,hezar canê te hebe,tu nikari yeki ji destê me xelas biki.Heta ku me te perçe ne kırıye were teslim bibe."

Guri vegeriya were ser kevokên xwe,go:

"Kevokên minî xweşik,hûn bızına mın dibinın Bo we çewa gulla dirêje.Hûn ji tışteki bıkın, mın ji dayıka mın ji kêfxweş bıkın."

Kevok serî didın hev,hıneki dî nav xwe da pıspıs kırın û dıvra bî hewa ketın çûn.

(dûmahık heye)

DI SALEKÎ DE ÇEND MEH HENE?

Şeveki sayi bû. Hiv û stêrk lî Ezmanan xweş xuya dîkir in. Mızgîn, Evindar, Şoreş û Çiya weki herşev hatin cem hev. Qala dibîstane nê û mamostêyê xwe kîrîn. Her çaran jî bêriya mamoste û dibîstana xwe kîrîbûn. Mızgîn Evindar, Şoreş û Çiya dî sınıfeki (Çinekê) de bûn. Her çar jî jî bo dersên xwe pîr jî jêhati bûn. Wexta dîhatin cem hev, tîştên ku fêrbû - bûn, jî hev dîpîrsîyan. Îşev dora Çiya bû. Çiya serê xwe rakir û lî ezman nîhêrt. Jî hevalên xwe re;

-Berî viya çend roja hiv wuha ne glover bû. We bala xwe daye ku hiv herdem ne bî şîk leki dertê; Gelo çîma?

Hemîyan tev de fîkîrin. Mızgîn xwest bersiv bîde û got:

-Hiv ronahiya xwe jî rojê distîne (digre). Lî dora dînê dizivire. Hiv gori stendina ronahiya jî rojê dî keve hî şîklên cûr be cûr. Van şîklên ku hiv distîne dî nav 30 rojan de tamam dibe. Mîrovin van 30 rojan bî navê "MEH" navandîne.

Şoreş gotina Mızgîn birî û got:

-Dî salekî de 12 meh hene. Ez dîxwazim her yek jî me navê sê mehan bêje.

Hemûyan qebûl kîrîn. Bî dor navê mehan gotin.

Mızgîn:

-Çîle, Sîbat, Adar

Şoreş:

-Nîsan (Avrîl), Gulan, Hêzîran

Çiya:

-Tîrmeh, Tebax, Îlon

Evindar:

-Cotmeh, Mijdar, Çıleya beri,

Hevalno, de werın, em ji navên mehan bınivı
sin ın.

1-Ç1....., 2-S1....., 3-A.....,

4-Ni....., 5-Gu....., 6-Hê.....,

7-Tir....., 8-Te....., 9-î.....,

10-Cot....., 11-mij....., 12-ç1.....be.....


ZAROKÊN ME

Bihêlın bla bıjin
Bla bikenın
Bıleyızın, bırevın
Zarokên me.

Bihêlın bla bıxwinın
Bla bınivısın
Bıbinın bıbihızın
Zarokên me.

Bihêlın bla bıxwın
Bla lıxwekın
Bıpeyvın, bıstrên
Zarokên me.

Bihêlın, bıhêlın
Bla şıyarbıbın
Serxwe û azabıbın
Hêviyên me....



Fırat CEWERÎ



EZ MENDALEKÎ ÇAR SALÎ ME
 MAMO
 EZ MENDALEKÎ ÇAR SALÎ
 EZ NIHA MALOKAN ÇEDIKÎ
 JI XWE RE
 EZ Ê JI MALOKAN AVA
 KIM MEHABADE
 MEHABADEK KU:
 JI AVAHIYÊN XWÊDANA
 MIN XEMILÎ

Rojen Barnas

KURDISTAN 81

HÊVÎ
 BOX 5034 16305

H Ê V Î:

ADRESS:

Kovara Kurdi ya zarokan
 Kurdish children magazine
 Kurdisk barn tidning

Hêvi:BOX 5034 163 05
 Spanga-SWEDEN
 Postgiro:439 33 42-3

PRIS:3 kronor / SUBSCRIPTION-ABONE:30 kronor per ar